

Dumahîk : Avabûna...

nemîne û birûxe. Lê, hêz û teşkîlatên rikberiyê ne li hev in, gelek nexweşî û nakokî di navbera wan de cî digrin. Û mixabin hewildanên bona pêkanîna yekrêziyê di navbera wan hêz û teşkîlatan de bi ser nakevin, lewre jî ev rewşa aloz, asteng û kûrkirîz dê heta demekê bidome.

- *Hûn Mixalefeta Ereban çawa dinirxînin? Mixalefeta Ereb ya Sûriyê, bi taybetî jî Îxwanî Mislîmîn ji bo alternatîfa rijîma BAAS çi pêşniyar dike? Di çareserkirina pîrsgirêka Kurd de perspektîva wan çi ye?*

- Îxwanî Mislîmîn li Sûriyê partiyeke siyasî pragmatîk e. Bi xêra alîkarî û piştgiriya hinek hêz û dewletên derve bûye xwedî roleke nîvsereke. Di derheqê pêşeroj û têkiliya Dîn û Dewletê de, Îxwanî Mislîmîn naxwazin cudabûn hebe. Û di derbarê pîrsgirêka Kurd de nêrîn û helwesta wan mijdar û pir bi guman e. Ew bi tevahî pîrsgirêka Kurd a netewî dibînin ku pîrsa hemwelatîyê ye. Hew zimanê wan dibêje “em hemî bira ne.”

- *Desteya Bilind a Kurd ku ji Meclîsa Neteweyî ya Kurdên Sûriyê (ENKS) û Meclîsa Gel a Rojavayê Kurdistanê (MGRK) ava bûye, pêşniyarên wî yên çareseriyê çi ne?*

- Avabûna Desteya Bilind a Kurd (DBK) li ba gelê Kurd li Sûriyê mizgîniyê balkêş bû, îro jî cîyê pîrozbahî û piştgiriya ye. Kar û barê DBKê ewe ku yekrêziya kutla cemawerî ya Kurd li Sûriyê bi cî bike, rewşa aram û aştiyane li herêmên Kurdî bi parêze, da ku herêmên Kurdan di vê qonaxa aloz û tevlihev de nebîne cîgehên pevçûn, xwînrijandin û bombebarankirinê. Nemaze bi deh hezaran êl û malbatên birayên me yên Ereb ên ku koçber bûne, îro di nav Kurdan de bi cî dibin û dijîn, û xelkê me yê Kurd wan hembêz dike. Bawerîya me ewe ku, çendî rewşa aram û aştiyane di herêmên Kurdî de bête parastin, ewqas ji serhildan û

pêşeroja Sûriyê re baş û bi sûd e.

- *Gava ji bo çareseriyê “Ji Gelên Sûriyê re Demokrasî, Ji Kurdan re Federasyon” were pêşniyar kirin, yanî gava Kurd, Erebên Nusayrî, Sûnnî û gelên nemislîman di bingeheke federal de werin cem hev, wê ev perspektîv çareseriyê bîne?*

- Sûriye taybetmendiyê xwe heye û zor awarte ye; modêla çareseriyê ne zelal e û Sûriye nabe Iraq. Tiştê herî zelal ewe ku rijîma yek-partî û Erebîtiya şovenîst ji hev bikeve û bi dawî bibe, xwînherikandin îro jî berî siba raweste. Û hemî hêz û dewlet li xwe vegevin, da ku li pirojeyê navnetewî xwedî derkevin û li ser rîya pêkanîna çareseriyê siyasî ji rewşa Sûriyê re gav bêne avêtin.

- *Tê gotin ku di navbera rojên 19 û 22-yên Tîrmehê de, gelê Kurd li bajarokên Kobanî, Dêrika Hemo, Efrîn û Amûdê desthilatdariyê bi dest xistine? Li ser tiştên ku li Rojavayê Kurdistanê diqewimin hûn dikarin çi bibêjin?*

- Karmend û berpirsiyarên dewletê ji neçarî, berê xwe guhertin û ji hinek herêmên weke Dêrik, Kobanê û Efrînê (Kurdax) bar kirin. Rijîma dewletê di warê birêvebiriya kar û barê hemwelatîyên xwe de ne xemxwar e, ew di rewş û qonaxê zor hesteyar de ye û berê wê bi hemî hêzên xwe li Şam, Heleb û cîgehên leşkerî yê stratejîk e.

- *Di nav van şertan de, bi armanca hevkarîya çar parçeyên Kurdistanê, hûn li ser hewcedariya civandina Konferansa Neteweyî dixwazin çi bibêjin?*

- Pêwîst e, û pîrseke mafdar û rewşa ye, ku nûnerên tevgera azadîxwaz a Kurd li her çar parçeyan li hev bicivin û pêşî konferansên şewrê **D.R.(6)**